

Dîroka lêgerîna dîalekta kurdîye Goranî.

N.G. Safonova

Bi navê Qanatê Keleş Kurdoyêv (1909-1985) re ne tenê şuxilvanîya zanîyarîyê, ya mezintirîn zanîyarê kurdnasî bi navê cîhanê de naskirî, tê girêdanê, lê usan jî avabûna (bi înisîyatîva mamostayê wî Î.A. Orbêlî) koma Lênîngradê ya kurdnasîyê sala 1959-an, ku wî bi xwe bêtirî çarêka sedsalîyê seroketî lê kir.

Q.K. Kurdoyêv timê bi xemxurî nêzikî şagirt û hogirên xwe dibû, usan jî guhê wî ser wan xwendkarê fakûltêta Rojhilatnasîyê bû, yên ku mêla wan ser ziman û dîroka kurda hebû. Awa di salên jîyana wî, yên dawî de, bi piştgirtina wî xudana vê gotarê bi seroketîya şagirta wî Z.A. Yûsûpova, dest bi lêgerîna zaravê soranî kir.

Q.K. Kurdoyêv gelek salan gîroyî lêgerîna dîalêktên (zaravên) kurdî bû û heta niha jî ew para kurdnasîyê di şuxulvanîya Koma Kurdnasan de dimîne ya sereke. Q.K. Kurdoyêv jibo pêşvabirina dîalêktologîya (zaravzanîya) kurdî karekî gelekî mezin kirîye. Cara yekemîn di lîngvîstîka welatê me de wî lêkolîna bîngêhîn, ya morfologîya û fonêtîka dîalêktên kurdîye kurmancî, soranî û zaza pêkanî, analîza wan, ya himberî hev kirinê kir. Ji aliyê wî de dîalêktên kurdî hatine kvalîfikasiya (hevbeş) kirin, ku kurdnasîya Rûsîyayê, ya dema me dipejirîne - hebûna du komên dîalêktayê sereke di zimanê kurdî de: ya bakûr û ya başûr. Şagirt û peyçûyên Q.K. Kurdoyêv karê lêgerîna dîalêktên kurdî, di nav wan de yê kêma lîkolayî, bi pêş ve dibin. Di kurdnasîyê de du monografîyayên, ku sala 1998-an ronahîdîtin: Î.A. Smîrnova û K.R. Êyûbî "Dîalêkta kurdî, ya zaza" (Dêrsim) 1) û Z. A. Yûsûpova "Dîalêkta kurdî, ya goranî bi peykarên litêratûrî, yên sedsalên XVIII-XIX" 2), emekên mezin bûn, jiber ku heta niha di litêratûra taybetî (spêşîyal) de

(payê pirê ya rojava) goranî û zaza çawan dîalêktên îranî, yên serbixwe tèn dîtin.

Jiber ku lêkolîna me wê ser peykarên goranî be, em bi kurtî dîroka lêgerîna wî binin ber çavan.

Sala 1881-ê zanîyarê înglîs Ch. Rieuⁱ yekemîn melûmetî di derheqa rêzimana goranî de anîne. Wî ew çawan şaxeke farsî dîtîye. Paşê E.B. Soan di “Antologîa poêzîa goranî, ya kurt”ⁱⁱ de gava rêzimana goranî şirovedike, wê çawa şaxeke farsî dide. A. Christensen sala 1921-ê ser bingeha matêriyalên Benedictsens şirovekirina şaxeke dîalêkta hewrimanî, ya navçeyî tîneⁱⁱⁱ, ku bi şaşî wek şaxeke goranî lê nihêriye. Ew mînakîya hewrimanî û zaza destnîşan dike, lê wan wek zaravên kurdî nabîne. Ramana derxistina goranî ji cêrga zaravên kurdî, Hadank K. hê bi pêş ve bir. Wî matêriyalên O. Mann di derheqa hinek dîalêktan de (hîmlî kandûlî)^{iv} çapkirin. Ew raman usan jî di matêriyalên F.C. Andreas, yê di derheqa dîalêktên îranî de heye, ku A. Christensen û K. Barr sala 1939-an çapkirin^v. Ew bawerîya di derheqa statûsa goranî de, bê guman bi rada pêşvaçûna zanîyarîyê, ya wê demê ve tê şrovekirin. Lê salên 50-emîn zanîyarê înglîs MacKenzie D.N. dicêribîne serbixwe bona goranî, dîalêktên nêzîkî wî û zaza bi zanîyarî di gotarên xwe (di nav wan de bi zimanê rûsî li kovara “Narodi Azi i Afriki) û monografiya xwe da “The dialekt of Awroman (Hawraman-i Luhon), 1966, mak bike^{vi}. Ew nêrîn ji alîyê çend îrannasên rûsî de jî hate pejirandin (R.L. Sabolov, L.A. Pîrêyko)^{vii}. Lê ew nêrîn çawa ji alîyên kurdnasên kurd, usan jî ji alîyê piranîya kurdnasên rûsî de hat rexnekirin, T. Wehbî, M.A. Hewramanî, Q.K. Kurdoyêv, Z.A. Yûsûpova, I.A. Smîrnova û K.R. Êyûbî, M.Û. Xamoyan.^{viii}

Bi vê re tevayî, çawa ji litêratûra taybetî tê xuyayê, cêrge zanîyara goranî û dîalêktên nêzîkî wî çawa teherên zimanê kurdî dîtine. Hela sala 1888-an V.A. Jûkovskî gotara “Tekîya

mervên rastîyê “ahli-hakk” li Pêrsîyayê” çapdike. Di vê gotarê de melûmetî derheqa kurdên goran û zimanê wan de hene. Ew melûmetî wî bi xwe ji xelkê berev kirine. Lê sala 1922-an, piştî mirina wî melûmetîyên di derheqa dîalêkta goranî, ya gundê Talaxadeşk (bakûr-rojava Şîrazê)^{ix} tên çapkirinê .Li monografiya J. de Morgan, ya ku sala 1904-an çapbûyê^x, şirovekirina rêzimanîyê ya van dîalêktên kurdî heye; hewrimanî, silêmanî, kêrmanşahî, sineyî, mukrî, cafi, recabî, lekî, xocevendî, yazîdî, garrûsî, usan jî navnîşên peyvên bi tîmayên cihê û nexşa dîalêktologîyê. Rojhilatnasê rûsayî nav û deng V.F. Mînskî di gotara xwe “Gûran”^{xi} de navkirina “gûran” enalîzdike û lêkolîna lîteratûra nivîskî, ya ser guranî tîne. Ew jibo şûna goranî bi temamî bê kivşkirin, pêvîvîya, pêvîstîya lêgerînên hê kûr yên dîalêktên îranî, di dûarojê de tîne ziman.

Di dereca lêgerîna goranî de xebatên îrannans û kurdnasê naskirî M. Mûkrî êtapeke nû ne. Ew cêrge nivîsarên olî-felsefî, ku di wan de melûmetîyên pir hêja ser “ahl -î heq” hene, usan jî destana folklorîyê bi zaravê goranî “Bîjan û Manîja”^{xii} çapdike. Têkst gişk bi wergera fransî, bi şrovekirinên fire û glossariyan hatine çapkirin.

Û dawîyê, monogragîya Z.A. Yûsûpova, ya jorê biranîyî “Dîalêkta kurdî goranî bi peykarên lîteratûryê, yên sedsalên XVIII-XIX”, nîrxê wêyî zanîyarîyê, yê taybetî heye. Ev xebata cara yekemîn şrovekirina goranî, ya bi sîstêm dide, ew jî cara yekemîn ser bîngeha serkanîyên nivîsar. Xudana monogragîyayê tenê piştî lêkolînên kûr, ya morfologîya, lêksîka û sînteksîsa goranî û bi himberî hev kirina ji alîkî ve tevî dîalêktên kurdîye başûr, ji alîyê mayîn ve tevî yên bakûr, statûsa wê dîalêktê dide. Z.A. Yûsûpova goranî dike nav koma dîalêktên kurdî, yên başûr, ku nav wê komê de ev dîalêkt hene; hewramanî,

kandûlaî, bacalanî û yên mayîn. Ev lêkolîn ji xudan re bû bingeh, wekî klassîfikasiya xwe, ya dîalêktên başûr bibe pêş:

1) Soranî, mûkrî, sulêymanî; 2) Goranî, hewramanî, bacalanî, kandûlî û dibe ku hin din ên mayîn; 3) Sinêyî, kermansahî, garrûsî, korûnî û yên mayîn. Hewramanî bi goranî ve dikevne nav komekê, lema jî nêrîna hewramanî çawa teherekî goranî ne rast e.^{xiii}

Bi dîalêkta goranî, ku demekê teherekî zimanê kurdî yê litêratûrî bûye, litêratûra nivîsare pir dewlemend heye. Makkirinekê wê yekê, ya berbiçav jî katalogên destnivîsarên kurdî ne, ku M.B. Rûdênko^{xiv} û Kemal Fuad^{xv} çapkirine. Di "Şirovekirina destnivîsarên kurdî, yên Lêningradê" de M.B. Rûdênko heşt nava tîne, ku efrandinê bi goranîne, di nav wan de şîrên lîrikîyê, poêma derheqa mêrxasîyên Rostem, efrandinên Mela Necef, Mela Şafî û yên mayîn. Şirovekirina kolêksîya almanî, ku zanyarê kurdî naskirî Kemal Fuad çê kirîye û sala 1970-î çapkirîye, malûmetiyên di derheqa 97 destnivîsaran hene, ji wana di 51-an de efrandinên bi dîalêkta goranî û dîalêktên nêzikî wî hene. Wan efrandina bi naverok dikarî parbikî ser yên litêratûrî, olî-felsefî û dîrokî. Kevntirîn efrandina bi goranî di wê kolêksiyayê de - "Perîşan-name" ji nîveka duyemîn, ya sedsalîa XIV tê û bergirtina (kopîya) sala 1313h./1846p.z. Beşeke kolêksiyayê, ya mezin destnivîsarên efrandinên şayirtiyê ne, ji janrên cihê. Ew gelek naverokên ji "Şah-name" ya Fîdoûsîne, poêzîya lîrikîyêye, di nav wan de efrandinên xudanên ûsa naskirî, çawa Ahmed Beg Komasi, Xana-î Qubadî, Welî Dêwane, Mewlewî û şaxên litêratûrî yên efrandinên usa, çawa "Mem û Zîn", "Şêx Sen'an", "Leyla û Mecnûn", "Şîrîn û Ferhad" û yên mayîn.

Peykerên nivîskî, yên bi goranî hê kêr hatine lêgerînê, lema jî çapkirina destnivîsaran nîrxê xweyî hêja heye. Di vî karî de êmekê zanyarên kurde ji Îraqê, ku cêrge dîwanên şayîrên goran

çapkirine, mezin e; Mewlewî, Welî Dêwane, Feqê Qadirî, Hemewendî, Cefayî, Rencûrî, poyêma Xana-î Qubadî “Şîrîn û Ferhad”.^{xvi} Lîtêratûra goranî bi xwe jî hema dikarî bêjî bê lêkolîn maye. Heta îro li meydanê tenê lêkolîna Enwer Qadir e di derheqa lîrika Mewlewî de.^{xvii}

Jibo pêşvabirina lêkolînên ser peykarên goranî, yên nivisar, me dest bi karê lêkolîna zimanê efrandina folklorî “Bîcan û Manîce” kirîye, ew têma têza me ya doktoryê ye. Sala 1966-an M. Mukrî têksta vê efrandinê (978 beyt), ser bingeha du destnivîsara, ku sala 1299h/1881z. hatibûn bergirtinê, çapdike. Bi gotina M. Mukrî, ev efrandin şaxa folklorî, ya perçê poêma Fîrdoûsî “Şah-name” ye bi zaravê goranî, ku li başûrê Kurdistan pir belavbûyîye û bi bawariya wî sedsaliya XVII hatiye nivîsar.^{xviii} Tişteki balkêş e, wekî di pertûka Kemal Fuad, “Destnivîsarên kurdî” de şaxeke wê poêmê jî bi goranî heye, ya ku xudanê wê, bi texmîn, mirovekî bi navê Almas Xan e.^{xix} Em bîrbînî, wekî şaxeke vê poêmê, ya kurt, bi soranî, bi pexşan heye, ya ku gelekî jî şaxa goranî dûr e.^{xx}

Di lêkolîna xwe de em dixwazin wê peykera liyor anîyî bi rîzmanî şirovekin. Xebata me jî pêşgotinê û beşa ne, ku di wan de melûmetî ser fonêtika, grafîka û rastnivîsara (orfografîya) têksta, morfologîya û sinteksîsê hene. Ya sereke beşa “Morfologîya” ye, ku di wê de xeysetê sistêma nava, cînava û fêla, usan jî pêşpirtik û paşpirtikan tê dayîn. Xên jî bisistêmî şirovekirina peykera lêkolîn kirî, di xebatê de himberî hevkirina zimanê têkstê bi goranîya lîtêratûrî re tê dayîn û cudatîyên taybetîya goranîya folklorî tên belûkirin. Bi giştî zimanê “Bîjan û Manîce” cudatîyên berbiçev jî goranîya folklorî nîşannake.

Tosinê Reşîd ji rûsî wergerand

Jêder:

1. Î.A. Smîrnova, K.P. Eyûbî. Kurdskiy diyalêkt zaza (Dersim) M. 1998
2. Z.A. Yûsûpova. Kurdskiy diyalêkt goranî po litêratûrnîm pamatnikam XVIII-XIX vv. Sant-Pêtêrbûrg, 1998
3. Rieu Ch. Catalogue of the Persian manuscripts in the British Museum. Vol. 2. L., 1881
4. Soan E. B. A short anthogy of Guran poetry//JRAS.1.1921
5. Christensen A. Les diyalectes d"Awromán et de Páwä. Textes recueillis par Åge Meyer Benedictsen, revus et publiés avec des notes et une esquisse de grammaire. København, 1921
6. O. Mann, K. Hadnak. Mundarten der Gûrân// Kurdisch-Persische Forschungen. Abt. 3. Bd. 2. B. 1930
7. A. Christensen, K. Barr. Aufzeichnungen über Kurdische Dialecte (Gärrúsí, Sennäí, Kermánšáhí, Korúní und Kälún-Abdúí)// Iranische Dialectaufzeichnungen aus dem Nachlass von F.C. Andreas. B., 1939
8. D.N. Makkenzî. Kurmancî, kurdî î gûranî. NAAyo 1963. No., s. 162-170. D.N. MacKenzie. The dialect of Awroman (Hawrámán-í Luhon). København, 1966
9. R.L. Tsabolov. Oçêrkî îstorîçêskoy morfologî kurdskoga yîzîka. M., 1987. R.L. Tsabolov. Kurdskiy yîzik// Osnoví îranskoga yîzîkoznaníya (û berhemên wíye dîn.) Rêdeksyon.
10. T. Wewhby. The origins of Kurds and their language// "Kurdistan", 1964, No. LX,X. M. E. Hewramanî. Zarí zimanî kurdî be tirazûy berawurdda. Bexda. 1981. K.K. Kûrdoyêv. Grammatîka kûrdskoga yîzîka na matêrialê dialêktov kurmancî î soranî. M., 1987. Z.A. Yûsûpova. Sûleymanskiy dialêkt kûrdskoga yîzîka. M., 1985. Z.A. Yûsûpova. O dialêktnom sostavê kûrdsloga yîzîka// □storîko-filologîçêskiy jûrnal Akadêmîy naúk Armênîy, 1990. No. 3

- (130), s. 164-170. Z.A. Yûsûpova. Kûrdskiy dialêkt goranî potêratûrnîm pamatnikam XVIII-XIX vv. SPb, 1998. □.A. Smîrnova, K.R. Eyûbî. K voprosû o dialêktnim sostavê kûrdsкого yîzîka// Lîngvîstîçeskîyê îsslêdovaniya. M. 1986.
- M.Y. Xamoyan. K îstorî îsûçênîa zaza// Voprosî frazeologî, stîlîstîkî î grammatîçeskogo stroya îranskîx yîzîkov. Samarkand, 1972. Vip. 225
11. B.A. Jûkovskiy. Sêkta "Lyodêy îstînî"- "Ahl-i hakk" v Pêrsî.// ZVORAO.2., 1888, s. 1-24
 12. J.de. Morgan. Études linguistiques. Dialectes kurdes, langues et dialectes du Nord dela Perse// Mission scientifique en Perse. T.5.P., 1904
 13. V. Minorskî. The Gûrán// BSO(A)S. Vol. XI. 1934-46, s. 75-103
 14. M. Mokri, La lègende de Bijan-u Manija. Version populaire du Sud du Kurdistan en langue gouranie. Txte ètabli, introduction, thèmes folkloriques, notes linguistiques. P., 1966 (û herweha berhemên wîye din di wê babetê de). Rêdeksyon.
 15. Binire jêdera 2a r. 156-157
 16. M.B. Rûdênko. Opîsanyê kûrdskîx rûkopîsêy lènîngradskîx sobranîi, M., 1961
 17. Kurdische Handschriften. Beschrieben von Kamal Fuad. Wiesbaden, 1970
 18. Dîwanî Mewlewî. Kokirdinewe u lêkolînewe u lêkdanewey Muhemed Ebdul Kerîm Muderîs. Bexda, 1961.
 19. Muhemed Enwer Qadir. Lîrîkay şaîrî gewrey kurd Mewlewî (1806-1882). Be dialêktî goranî). Stockholm, 1990
 20. Binîre jêdera 14a, r. 1; 11
 21. Binire jêdera 17a, r. 37-38
 22. D.N. MacKenzie. Kurdish dialect studies II. L., 1962, s. 92-106
